# Guhestin ji dibistana seretayî bo Pola 5an – Zanyariyên giştî

Dêûbavên hêja,

Qonaxeke nû ya jiyanê ji bo zarokê we dest pê dike. Serdema dibistana seretayî bi dawî dibe û guhestin bo pola 5an di pêşberî wî/wê da ye. Zarokê we hevaline nû nas dike û ji bo çûyîna bo dibistanê pirrî caran ji cihê mayînê yê nêziktir dûrtir dibe. Em bi vê daxuyaniyê dixwazin hin zanyariyên girîng ji bo vê pêngava mezin ji bo serxwebûnê raberî we bikin.

Bajarê Oldenburgê xwedan hejmareke zêde ya dibistanên ji pola 5an û bilindtir e: Dibistanên Navîn (Oberschulen), Dibistanên Giştalî yên Yekparçe (Integrierte Gesamtschulen) û Xwendingehên Bilind (Gymnasien). Her wiha xwendina di dibstaneke zarokên îstisna (Förderschule) jî hema wisa pêkan e. Her yek ji dibistanan karekî guncan pêk tîne. Ji ber vê yekê, em ji te ra pêşniyaz dikin ku der barê bernameyên hemî dibistanan zanyariyan bi dest bixin. Malperên dibistanan destpêkeke baş ji bo vî karî ne.

Li hemî dibistanan cih ji bo wergirtinê sînordar in. Ji ber vê yekê, ji kerema xwe teqez bala xwe bidin ser demên navnivîsandinê yên li paş rûpelê. Tenê di vê rewşê da we heta radeyeke zêde şans ji bo cihekî pejirandin û wergirtinê li dibistana têkildar heye

Tevahiya dibistanan li Oldenburgê bi awayê giştalî dixebitin. Hûn dikarin zanyariyên pirtir li ser vê mijarê li nav Înternetê li www.oldenburg.de/inklusion bi dest bixin

Zanyariyên giştî der barê dibistanên Oldenburgê li malpera bajarê Oldenburgê www.oldenburg.de/schule

## Dibistanên Navîn (Oberschulen)

Li Oldenburgê Dibistana Navîn a Oberschule Alexanderstraße, Dibistana Navîn a Oberschule Eversten, Dibistana Navîn a Oberschule Ofenerdiek û Dibistana Navîn a Oberschule Osternburg di bin sîvana piştevaniya darayî ya bajarê Oldenburgê da ne. Di tevahiya van dibistanan da xwendekar di salên destpêkê da, bêyî berçavgirtina asta şiyanên wan bi hev ra fêrkariyê werdigirin.

Dibistanên Navîn (Oberschulen) derfeta ji bo bijartina zimanekî derveyî ya duyem û her wiha çiqên aborî, teknolojî û tenduristî û karûbarên civakî ji bo xwendekaran dabîn dikin. Pişk û para bilind a xebata zanistî û rênîşandaneke karî ya bingehîn bi awayekî taybet tê destnîşankirin. Li Dibistanên Navîn (Oberschulen) hemî bawernameyên bidawîanîna heyama navîn a yekem dikarin bên wergirtin. Bi bawernameya perwerdehiya navîn a temamkirî ya yekem, xwendina di qonaxên bilindtir ên Xwendingehên Bilind (Gymnasien) û dibistanên giştalî (Gesamtschulen) û her wiha fêrgehên teknîkî û pêşeyî derdem piştî pola 10an pêkan e. Piştra ev kûrsên xwendinê bi bawernameya derbasbûna bo Navenda Perwerdehiya Bilind a Gelemperî (Abitur) bi dawî dibin.

Navnivîsandin li dibistana têkildar pêk tên. Di vî warî da ji bo her zarokekî kapasîteyeke (kontenjaneke) wergirtinê li Dibistaneke Navîn (Oberschule) tê misogerkirin. Helbet Konseya bajarê Oldenburgê hin lezên bêguherîn diyar kirine. Ji ber vê yekê, tevî navnivîsandinên gelekî zêde, mafê kesekî ji bo Dibistaneke Navîn (Oberschule) a diyarkirî tuneye. Ji ber vê yekê, em ji we ra pêşniyaz dikin ku di belgeya navnivîsandina xwe ya bijartina duyem û heta bijartina sêyem ragihînin da ku şansê we ji bo kontenjanekê li dibistanekê zêde bibe.

Zanyariyên zêdetir li malperên dibistanan hene:

| | |
|---|---|
| Oberschule Alexanderstraße | www.obs-alex.de |
| Oberschule Eversten | www.obs-eversten.de |
| Oberschule Ofenerdiek | www.obs-ofenerdiek.de |
| Oberschule Osternburg | www.obs-osternburg.de |

Ji bilî Dibistanên Navîn ên bajêr, Paulus-Schule jî heye:

| | |
|---|---|
| Paulus-Schule | www.paulus-ol.de |

## Dibistanên Giştalî yên Yekparçe (Integrierte Gesamtschulen)

Li Oldenburgê, dibstana Integrierte Gesamtschule Helene-Lange-Schule, dibistana giştalî ya yekparçe ya Integrierte Gesamtschule Flötenteich û dibistana giştalî ya yekparçe ya Integrierte Gesamtschule Kreyenbrück di bin piştevaniya darayî ya bajarê Oldenburgê da ne. Taybetmendiyên van dibistanan ciyawaz in. Di hemî Dibistanên Giştalî yên Yekparçe (Integrierte Gesamtschule) da xwendekar bêyî berçavgirtina asta şiyanên wan bi hev ra fêrkariyê werdigirin. Di qonaxa bilindtir da ew heta radeyekê bi Xwendingehên Bilind (Gymnasien) ra hevkarî dikin û bi vî awayî derfet ji bo bijartina hema bêje hemî pêkhateyên dersan dabîn dikin.

Dibistanên Giştalî yên Yekparçe (Integrierte Gesamtschule) derfeta tayînkirina tûş û rêya perwerdehiyê ji bo xwendekarên xwe dabîn dikin ku tê da hînbûna zimanê fransî an spanyayî wek zimanê derveyî yê duyem jî pêkan e. Wergirtina hemî bawernameyên serdema navîn a yekem û bawernameya derbasbûna bo Navenda Perwerdehiya Bilind a Gelemperî (Abitur) pêkan e.

Di polên xwendinê yên xwartir da, raporên pêşketina hînbûnê dewsa lîstya nimreyan digirin. Heta pola 10an tu biryarek ji bo guhestina xwendekar bo pola bilindtir tuneye.

Navnivîsandin li dibistana têkildar pêk tên. Tu mafek ji bo kontenjanekê li dibistaneke giştalî (Integrierte Gesamtschule) ya yekparçe tuneye. Ji ber vê yekê, pêşniyaz tê kirin ku di rewşa nepejirandinê da, ji pêş va derbarê dibistanên din ên gengaz bifikirin.

Zanyariyên zêdetir li malperên dibistanan hene:

| | |
|---|---|
| Integrierte Gesamtschule Flötenteich | www.igs-floetenteich.de |
| Integrierte Gesamtschule Helene-Lange-Schule | www.hls-ol.de |
| Integrierte Gesamtschule Kreyenbrück | www.igs-kreyenbrueck.de |

Ji bilî Dibistanên Giştalî yên Yekparçe li bajarê Oldenburgê, dibistana Freie Waldorfschule Oldenburg û Freie Schule Oldenburg jî hene:

| | |
|---|---|
| Freie Waldorfschule Oldenburg | www.waldorf-oldenburg.de |
| Freie Schule Oldenburg | www.freie-gesamtschule-oldenburg.de |

## Xwendingehên Bilind (Gymnasien)

Li Oldenburgê, Alte Gymnasium (xwendingeha bilind a kevn), Gymnasium Cäcilienschule, xwendingeha bilind a Gymnasium Eversten, Herbartgymnasium û Neue Gymnasium (xwendingeha bilind a nû) di bin piştevaniya darayî ya bajarê Oldenburgê da ne. Taybetmendiyên van dibistanan ciyawaz in. Hemî xwendingehêîn bilind (Gymnasien) ên xwedan qonaxeke bilindtir a taybet in ku dawiya wê bawernameya derbasbûna bo Navenda Perwerdehiya Bilind a Gelemperî (Abitur) ye. Hevdem hemî Xwendingehên Bilind (Gymnasien) di qonaxên bilindtir û heta radeyekê digel Dibistanên Giştalî yên Yekparçe (Integrierte Gesamtschule) bi hev ra dixebitin, bi awayekî ku hema bêje hemî pêkhateyên dersan dikarin bên raberkirin.

Navnivîsandin li dibistana têkildar pêk tên. Di vî warî da, ji bo her zarokekî kontenjanek li xwendingeheke bilind (Gymnasium) tê misogerkirin. Helbet Konseya bajarê Oldenburgê hin lezên bêguherîn diyar kirine. Ji ber vê yekê, tevî navnivîsandinên gelekî zehf, tu mafek ji bo xwendingeheke bilind (Gymnasium) a diyarkirî tuneye. Ji ber vê yekê, em ji we ra pêşniyaz dikin ku di belgeya navnivîsandina xwe ya bijartina duyem û heta bijartina sêyem ragihînin da ku şansê we ji bo kontenjanekê li dibistanekê zêde bibe.

Zanyariyên zêdetir li ser malperên dibistanan hene:

| | |
|---|---|
| Altes Gymnasium | www.altesgymnasium.de |
| Gymnasium Cäcilienschule | www.caeci.de |
| Gymnasium Eversten | www.gymnasium-eversten.de |
| Herbartgymnasium | www.herbartgymnasium.de |
| Neues Gymnasium | www.neuesgymnasium.de |

Ji bilî Xwendingehên Bilind ên bajarê Oldenburgê, xwendingeha bilind a Gymnasium Liebfrauenschule'yê jî heye. Her wiha dibistana Graf-Anton-Günther-Schule di bin piştevaniya darayî ya navçeya Oldenburgê da ye ku helbet tu xwendekarekî ji bajarê Oldenburgê napejirîne.

| | |
|---|---|
| Gymnasium Liebfrauenschule | www.liebfrauenschule.de |

**Weşanger:**
Bajarê Oldenburgê, Şaredarê gişt, Rêveberiya dibistanê û Perwerdehiyê
Dem: Cotmeha 2022an
Pirsên gişt ji bajarê Oldenburgê ji kerema xwe ji Navenda Xizmetan
bi rêya hejmara telefona 0441 235-4444 an jî bi rêya E-Mailê hilêxîne servicecenter@stadt-oldenburg.de .

## Civînên ragihandinê ji bo sala xwendinê ya 2023/2024

### Oberschule Alexanderstraße
- În, 10ê Adara 2023an, saet 10.30 heta 12.15 roja têketina azad
- Duşem, 15ê Gulana 2023an, saet 19

### Oberschule Eversten
- Duşemî, 20ê Adara 2023an, saet 18

### Oberschule Ofenerdiek
- Pêncşem, 9ê Adara 2023an, Roja ceribandinê (ji kerema xwe saeta wê ji malpera dibistanê bibîne)
- Duşem, 13ê Adara 2023an, saet 19:30

### Oberschule Osternburg
- Pêncşem, 16ê Adara 2023an, saet 9:30 heta 12:30
- Pêncşemî, 16ê Adara 2023an, saet 19
- Pêncşemî, 20ê Nîsana 2023an, saet 19

### Integrierte Gesamtschule Flötenteich
- Pêncşemî, 24ê Mijdara 2022an, saet 9 heta 12:30 roja têketina azad
- Pêncşemî, 16ê Adara 2023an, saet 19
- Sêşemî, 21ê Adara 2023an, saet 19 tenê bi awayê dîjîtal

### Integrierte Gesamtschule Helene-Lange-Schule
- Sêşemî, 7ê Adara 2023an, saet 19:30
- Pêncşemî, 16ê Adara 2023an, saet 12:30, roja têketina azad

### Integrierte Gesamtschule Kreyenbrück
- Pêncşemî, 2ê Adara 2023an, saet 9 heta 12 roja têketina azad
- Çarşemî, 8ê Adara 2023an, saet 19

### Altes Gymnasium
- Şemî, 4ê Sibata 2023an, saet 9:30 roja têketina azad
- Pêncşemî, 23ê Adara 2023an, saet 19

### Gymnasium Cäcilienschule
- Şemî, 18ê Sibata 2023an, saet 10 heta 13
- Pêncşemî, 23ê Sibata 2023an, saet 18 ji bo çiqa fêrkirina mûzîkê

### Gymnasium Eversten
- Şemî, 11ê Adara 2023an, saet 10 heta 13

### Herbartgymnasium
- Duşemî, 13ê Sibata 2023an, saet 17
- Şemî, 4ê Adara 2023an, saet 10 heta 12 ji bo Pola jenerîên sazên bayî û strînê

### Neues Gymnasium
- Şemî, 11ê Sibata 2023an, saet 10 heta 13

### Paulus-Schule
- Çarşemî, 15ê Adara 2023an, saet 14 heta 17 roja têketina azad

### Gymnasium Liebfrauenschule
- Şemî, 25ê Sibata 2023an, saet 9 heta 13 roja têketina azad

### Freie Schule Oldenburg
- Şemî, 10ê Kanûna 2022an, saet 10 heta 13 roja dibistanan zelal
- Şemî, 11ê Sibata 2023an, saet 10 heta 13 roja dibistanan zelal
- Sêşemî, 14ê Adara 2023an, saet 19.30

## Demên navnivîsandinê ji sala xwendinê ya 2023/2024

### Dibistanên Navîn ên bajêr (Städtische Oberschulen)
- Sêşemî, 23ê Gulana 2023an, saet 8 heta 12
- Çarşemî, 24ê Gulana 2023an, saet 8 heta 12 û 15 heta 17
- Pêncşemî, 25ê Gulana 2023an, saet 8 heta 12

### Dibistanên Giştalî yên Yekparçe yên bajêr (Städtische Integrierte Gesamtschulen)
- Çarşemî, 26ê Nîsana 2023an, saet 14 heta 18
- Pêncşemî, 27ê Nîsana 2023an, saet 8 heta 12 û 13 heta 18
- În, 28ê Nîsana 2023an, saet 8 heta 13

### Xwendingehên Bilind ên bajêr (Städtische Gymnasien)
- Sêşemî, 23ê Gulana 2023an, saet 8 heta 12
- Çarşemî, 24ê Gulana 2023an, saet 8 heta 12 û 15 heta 17
- Pêncşemî, 25ê Gulana 2023an, saet 8 heta 12

### Paulus-Schule
- Navnivîsandin di her demekê da pêakn e, dawiya navnivîsandinê 24ê Adara 2023an

### Gymnasium Liebfrauenschule
- Duşemî, 6ê Adara 2023an, saet 14 heta 19
- Sêşemî, 7ê Adara 2023an, saet 14 heta 19
- Çarşemî, 8ê Adara 2023an, saet 14 heta 18

### Freie Waldorfschule Oldenburg
- Navnivîsandin di her demekê da pêkan e

### Freie Schule Oldenburg
- Navnivîsandin di her demekê da pêkan e

Ji bo navnivîsandinê divê esla rêziknameya nimreyan (karname) a nîvsala yekem a pola 4an hebe. Ji kerema x we ji dibistana têkildar bixwaze ka gelo belgeyên din ên zêdetir pêwîst in an na.

Di dema niha da hîn mirov nikare bibêje ka rewşa Koronayêî heta dema civînên ragihandinê û demên navnivîsandinê çawa bi pêş da diçin û gelo ev babet bi awayê plandarêştî dê pêkan bin an na. Ji ber vê yekê, ji kerema xwe di dema pêwîst da derbarê gherînên demê yên gengaz ji dibistanan agahiyan werbigirin.

**Weşanger:**
Bajarê Oldenburgê, Şaredarê gişt, Rêveberiya dibistanê û Perwerdehiyê
Dem: Cotmeha 2022an
Pirsên gişt ji bajarê Oldenburgê ji kerema xwe ji Navenda Xizmetan
bi rêya hejmara telefona 0441 235-4444 an jî bi rêya E-Mailê hilêxîne‚ servicecenter@stadt-oldenburg.de‘ .

STADT OLDENBURG i.O.